

Şagirtiya li ber destê

comMIT!ment
çi ji te re tîne



- Belgenameyeke beşdarbûnê
- Di miracaetê ji bo stajê/şagirtiyê/xwendina zanîngehê de angajmana şexsî bi vê yekê xuya dibe. Maneya angajmanê ev e: vekirbûna li tiştan û amadebûna fêrbûnê. Ev jî di pêvajoyên miracaetên wiha de timî bi kêr tînin.
- Waqifbûn û naskirina meydanên nû yê pîşeyî (Xebata civakî, perwerdekar)
- Merît û kafîtiya ji bo ku mirov karê miqatebûna li zarok û ciwanan a piştînivrojê li dibistanan / li malên ciwanan bike
- Gihandina zanîn û rêbazên nû di karê pedagojîk de
- Teşwîqkirina behremendiyên şexsî bi xwe û ewlebûna xwe bi xwe
- Pevgirêdana bi toreke teamler (endamên tîmeke xebatê) re

**Kerem kin, peywendiyê
bi me re deynin:**

comMIT!ment

Jungenarbeit Hamburg e.V.

Bramfelder Straße 102 B

22305 Hamburg

Tel.: 040 / 607 85 919

commitment@jungenarbeit.info

www.jungenarbeit.info/commitment

<https://www.facebook.com/projekt.commitment>



Ein Projekt von



Gefördert durch



Jungenarbeit Hamburg e.V. (Komeleya Karê Ciwanan) hemilê Freie Jugendhilfe (Alikariya Ciwanan a Serbest) ye û weke komeleyeke li xêra civakê hatiye qebûlkin. Em endam in li Paritätischen Wohlfahrtsverband (Yekîtiya Refahê ya Wekhevîxwaz) û BAG Jungenarbeit e.V. (Koma Federal a Xebatê ya Karê Ciwanan).



comMIT!ment

dixwaze

- mirovan xurt bike, wan mirovên ku bûne mexdûrên cudakerî û lidervehiştinê û yan jî hîna mexdûrê wan in,
- tecrûbeyên şexsî teşwîq bike weke destpêka kirina xweser, li ser hatî fikirîn û bi xwe bawer tê kirin,
- wan rêyan nîşan bide ku diçin ber bi jiyaneke bi hev re ya hemû mirovan bi hevmafî, ji nijadperestî,
- cinsiyetparêzî û homofobiyê paqijkirî,
- behremendiya hiskirina kesên din û qabîliyeta xweîfadekirinê xurt bike,
- bike ku têkeriya xwe bi xwe di jiyana rojane de karibe bête tecrûbekirin,
- derfetên mayînde ji bo danûstandin û kirina bêşidet xurt bike û
- muktesebatên civakî zêde û berfireh bike.

comMIT!ment

çi ye

Projeya comMIT!mentê ji bo ciwanan û mêrên ciwan e ku temenê wan di navbera 16 û 27 salan de ye. Em dixwazin wan heyranî wê yekê bikin ku jiyaneke bi hev re a di nava civakê de biparêzin, bi wî rengî ku hemû mirov xwediyê heman mafan bin. Em dixwazin mirovên ciwan li ser mijarên nijadperestiyê, dijminatîya jinan û homoseksuelan hestiyar bikin. Em dixwazin destekê bidin wan di karûbarê wan ê ji bo baldarî, pirrengî û rûmetê de. Proje bi du gavan bi rê ve diçe. Di gava pêşî de yên ku elaqeya wan heye beşdarî komxebateke sê yan jî pênc saetî dibin. Li vir ew derfet çêdibe ku ew kes projeyê û mijarên wê yên sereke nas bikin.

Di gava diduyan de mêrên ciwan dikarin şagirtiyêke teamler (endametiya tîmeke xebatê) bikin. Em bawer dikin ku mirovên ciwan ew kes in ku hawîrdora jiyana xwe herî baş nas dikin. Ji ber vê yekê em destekê didin wan ku ew bi xwe rêyan bibînin ji bo bihevrejîyanahemmafî. Bi şagirtiyê derfeta beşdaran çêdibe ku ew zanîn û tecrûbeyê bidin hevsal û hogirên xwe.

comMIT!ment van

xizmetan pêşkêş dike

- şagirtiyêke ji bo bûna team!er (endametiya tîmeke xebatê) (asayî em hefteyê carekê 2 saetan dicivin û bi temamî 25 civîn in),
- derfeta ku wekî team!er mirov zanîn û tecrûbeya xwe bide hevsal û hogirên xwe,
- miameleyêke bi naverokê û bi pratîkê ya bi nijadperestiyê, dijminatîya jinan û homoseksuelan re,
- minaqeşeyên li ser wê yekê ka mirov çawa ji bo pirrengiya civakî û hevmafîya hemû cinsan bixebite,
- derfeta tecrûbekirina şanoyê bi rêbazên pedagojîk,
- fêrbûna stratejiyên danûstandina bê şidet,
- şensê berhevkirina tecûbeya birêvebirina sinifên dibistanan yan jî koman û
- teatiyêke fikran bi mirovên peywendîdar re li ser mijar û babetên comMIT!mentê.